

Lêzanîn jibo dêbavan/sergêr û nûciwanan derbarê Rapirsîna Ungdata

Îsal, Rapirsîna Ungdata li xwendîngehên navîn ên dewreya yekem li navçeya Şaredariya te pêk tê. Armanc ev e ku dîmeneke giştî ya durust ji rewşa pêkhatina nûciwanan bi awayê xweçihî bi dest bixin. Loma, girîng e heta radeya pêkan di vê rapirsînê da beşdar bibin. Ev rapirsîn di nîvsala biharê da da li dibistanê dê pêk bê.

ARMANCA RAPIRSÎNÊ

- Jibo zarok û xortan vê derfetê dabîn dike ku derbarê rewşa mezinbûnê li şaredariyê hin lêzanînan bidin rayedar û berpîrsên xweçihî.
- Derbarê rewş û şert û mercên mezinbûna zarok û xortan jibo hevkarîya rayedarên kantî / şaredariyê bi vê koma mtemenî lêzanînen nû bîn wergirtin.
- Berhevdanîn digel kesayetiyên din ên neteweyî û şaredariyan û alîkariya bo lêkolînê pêkan bibe.

LI RAPIRSÎNA UNGDATA EMÊ DERBARÊ ÇI Babetan Bîpîrsîn?

- Têkiliya bi dibistanê, dost û dêbavan ra
- Demên betlaniyê û çalakîyên demên betlaniyê
- Bikaranîna medyayê
- Tendurustî, rihetî û çawaniya jiyane
- Zorbêjî
- Binpêkirina qanûnê, tundî û bikaranîna madeyên hişber
- Asta xwendabûna dêbav/sergêran

RAPIRSÎNA UNGDATA ÇAWA PÊK TÊ?

- Saetek li dibistanê jibo kemilandin û pêkanîna Rapirsînê hatiye terxankirin.
- Ev rapirsîn bi awayê elektronîkî û bi tîketina nav rûpela bersivdanê ya Ungdata bi bikaranîna kodeya rêpêdayî ya yekcarî û random pêk tê.
- Xwendekar bi tîk-kirina pirsnameyê bersiva pirsan didin. Bijardeyek heye ku pirsên heyî li pirsnameyê bi dengê bilind dixwîne. Heke ev kiryar were bikaranîn, divê berguhk were bikaranîn.

BEŞDARÎ DILXWAZÎ YE

- Ev Rapirsîn dilxwazî ye
- Kesên ku bersivê didin dikarin dev ji pirsên ku naxwazin bersiva wan bidin, berdîn û heke bixwazin di heyama pêvajoya bersivdanê da, dikarin dawî li rapirsînê bînin.

- Dêbav/sergêrên nûciwanên bin temenê 18 salî dikarin bi haydarkirina fêrkarê tîkildar/dibistanê, vebijêrin ku zarokê wan beşdarî Rapirsînê nebe.

JIYANA KESANE

- Bersivên beşdaran bi awayê nihênî tîn proseskirin û hilkolandin. Tenê lêkolêr û şewirmendên projeyê û komûpaniya ku bersivan tomar dike, dê bikare hemî bersivan bibîne.
- Dema weşandina encamên Rapirsînê, tu yek ji kesên beşdar dê neyê naskirin.
- Daneyên lêkolînê yê pêkhatî ji daneyên kesane yê ne-rasterast ên ihtimalî, bi awayekî ewleh tîn parastin. Di dawîya sala pêncem a piştî bidawîhatina Rapirsînê da, hemî dane nenas dimînin.
- Rapirsîna Ungdata ji aliyê berpîrsa Parastina Dane û Lêzanînan li OsloMet (personvernombud@oslomet.no) va hatiye piştrastkirin.
- Seta dane û lêzanînan dê pêkhatî ji tu cûre lêzanînen kesane yê rasterast nebe. Loma sererastkirin an jêbirina daneyên beşdaran piştî vê rapirsînê jî dê pêkan nebe.
- NOVA daneyan li gorî razîbûna beşdaran proses dike.

AMADEBÛN

Xizmetên tendurustîya dibistanan kiryarên pêwîst ên amadebûnê piştî rapirsînê jibo her yek jixwendekarên ku hewceî pê heye, berçav girtiye.

KÎ BERPÎRSÊ UNGDATA'YÊ YE?

Ev rapirsîn ji aliyê enistîtûya lêkolînen civakî ya Norwejê NOVA li OsloMet (Zanîngeha 'Oslo Metropolitan') û Navenda Hêjatiya Dermanî û Elkolî ya Navçeyî (KoRus), li gorî tayînkirina şaredariyê pêk tê.

GELO PİRSEKE TE HEYE?

Jibo wergirtina lêzanînen pirtir derbarê rapirsînê, ji kerema xwe digel dibistanê an KoRus ya navçeya xwe bikeve tîkiliyê.

Heke dixwazî versiyona Norwejî an Inglîsî ya Pirsnameyê werbigirî, tu dikarî bi tîkiliya bi KoRusra, vî karî bikî.